

Eyûb





Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to
this comic book as provided by United
States copyright law.

Print and digital copies of this version may
be freely distributed without penalty under
a Creative Commons license.

Diyarê Ûsê

Mal û malbata Eyûb.



Eyûb, bavê heft kur û sê keçan, ne tenê bi dewlemendiya xwe ya mezin li seranserê rojhilatê binavûdeng bû --

--lê belê bi hezkirina xwe ya germ ji bo Xwedê, malbata xwe, heval û dostên xwe û herwisa mirovên din jî.

Ez tasa xwe jî mîvandare xwe re radikim!



Eyûb! Ew ew zîlam e ku ez dixwazim mîna wî bim û ez hêvî dikim ku zarokên min jî wê bixwazin mîna wî bibin!

Êlîfaz, dostê min! Tu pir camêr û xweşmîrov î!



Ji dil? Ka binêre te çi ziyafet ji me re amade kiriye!

Bah, tu dostê min î.

Na, ji wê bêtir, tu mîna malbata min î!

Na, ji wê bêtir, tu mîna malbata min î!



"Malbat" wek
ku ew dibêje! Ma ew
ji dil wisa ye!?

Eyûb, ji ber ku
tu kes ku ji malbata
xwe wekî te hezbike
tune.

Êlîfazê Têmanî ji diyarê Têman
bû ku gelê wê bi şehrezayî û bi
aqilmendiyê hatibûn naskirin.



Êlîfazê Têmanî
ji diyarê Têman bû ku
gelê wê bi şehrezayî û
bi aqilmendiyê
hatibûn naskirin.

Bîladê Şûahî, kurê Şûah
ku kurê Îbrahîm bû. Ew ji
çolê Erebî yê li aliye
rojhilatê bû.



Eyûb! Ez nizanim
ku te çi kiriye ku tu
hêjayê vê dewlendiyê
û vê malbatê bî -

-- Ka ji min re
bêje ku ez jî mîna
te bikim!

Sofarê Naemayî, ew jî ji bajarê
Naemaya ku li ser sînore bû.



Ew ji Eyûb
re zilamekî camêr,
dilsoz û bawermend
bû!

Tîşteke baş e
ku ew mirovekî
nefsbiçûk e an jî pesin
tên li ser wî!

Tîşteke baş e ku ew mirovekî
nefsbiçûk e an jî pesin tên li
ser wî!



Qurbanan?

Eyûb qurbanan ji
Xwedê re pêşkêş dikir ji
ber ku belkî zarokên wî
dema ziyafetê guneh
kiribin.

Xwedê ji me dixwaze
ku em ji ber gunehên xwe
tişteke bidin. Em ne pîroz
û nepak in.

Ez ji wan hezdkim,
loma ez li şûna wan
diçim ba Xudan.



Ez ji wan hezdkim,
loma ez li şûna
wan diçim ba
Xudan.

Ew dema ziyafetê
heta nivê şevê didin,
loma ez ê qurbanan
heta serî sibê pêşkêş
nekim.

Tu xem nexwe,
ezê ziyafeta xwe
hindik nekim!

Ah, pir baş
e, min dixwast
vê yekê
bihîstiba!



Heger tu kes ku dikare qurbanan
ji yên din re pêşkêşbike hebe,
îcar ew kesa tu yî, Eyûb.

Na Êlîhû.
Zilam bi vî awayî
nepîve --



-- Ji ber ez
ji yek ji we ne
gewretir û ne
baştir im.

Ne li pêşiya
Xwedê, ji ber em
hemû li ba pîroziya Wî
gunehkar û kirêt
in...

Ka bila em
niha xwarina xwe
bixwin, çimkî ew
sar dibe!



Dotira sibê zû.



Eyûb bi gotina
xwe kir.

Wek ku ew herdem
dikir.



Xudanê min,
ez li şûna zarokên
xwe tîm ba Te.

Te min bi
wan re pêroz
kir --
-- Heger ew di
dîlê xwe de çêrî te
kiribin, qurbana min
qebûl bike!



Eyûb dizanî ku
Xwedê kirinên
wî dîtîn.

Lê nedizanî ku heger kesekî
an jî tiştekî din hebe ku wî û
kirinên wî jî dîtîn.



Li ezmanan, hebûnên
Xwedê xwe li pêşiya
Xwedê pêşkêş kirin.

Û yekî din - ew çavdêrî
yê nayê dîtin - hat li
nav wan jî.

Kesekî ketî.

Kesê pêşî ji nav
ên ketiyan.

Îblîs.



Tu ji ku
derê têtî?

Ez li nav
mîrovên erdê
bibûm.

Min li vir û li
wir diçû û çavdêrî
li wan heywanên
ku tu ji wan pîr
hez dikî kir.

Erê, rast e.



Li zeviyê
Eyûb.





Li ser girên ên keviyê zewiyê
Eyûb ku keriyên wî li wir
diçêriyan.



Ew bêhna
çî ye?



Heryek!

Bibez!

Tîştêk.



Karvanê hêştirên
Eyûb.



Mala kurê Eyûb
ê herî mezin,
Omar.





SSSSSSSS



Gelek spas ji bo parvekirina sifreya xwe bi min re!

Em ê di nêz de hevdu bibînin!



Min vê sibê qurbana te dît, Eyûb..

Hezkirina te ji bo Xwedê bêhempa ye.

Ew nimûneyek di dilê min de ye.

Gelek spas, Êlihû.



Ew nimûneyek e jî ku dikeve dilê yekî.

Tu dilê min digirî, jina min a delal!

Dilgirtin? Qet!



Û niha, gelo ez dikarim ew sêniya zêrîn ku hesinkar li bajêr difiroşe ji xwe re bikirim?

Belkî... Lê piştî bihistina çend gotinên şêrîn û xweş!

Ezbenî! Ezbenî!



Ew çî bi serê te hatiye, Eved?

Ezbenî... Tenê ez ji mirinê filitîm...

Sabaiyan... ew bê hişiyarî êrîşî kirin û hemûyan kuştin û hertişt birin!



Hannam, ma tu jî hat êrîşî kirin?

Na... agirekî ji ezmên ketîf

Ew zevî, pez û hemû şivan qedandin, lê ez tenê mam!



Ev nabe! Tarum? Je keremate, ka mizgîneke ji min re bêje!

Kaldaniyan êrîşî li ser me kirin!

Ew me dorpêç kirin, hemûyan kuştin û hêştir bi tevahî birin!

Ezbenî! Tişekî xerab çêbû!

Ez dizanim! xulam mirin! Dewar û Min bihîst! pez hatin kuştin an hatin dizîn! Rewş tirsonek e!

Na, ezbenî! Ji wê wêdetir!

Xerabtir!?! Şêt, ji wê xerabtir, wê çî bibe?



Kur û keçên te li mala
birayê xwe yê mezin
kêf dikirin...

Ez vê yekê
dizanim! Îcar ew tu
çi dixwazî ji me re
bêjî?

Bahozeke
mezin, ezbenî...
li xaniyê xist...

Xanî hilweşî...
Me li nav keviran
gerî û me hemûyan
dît, lê ew bi tevahî...
bi tevahî...

Na.
Oh Na... Na...
Na... Na...

Na!!!

Na, ez
înan nakim!!!
Na!!!

Bîbîkên
min... Zarokên
min ên delal...





Na! Na!
Na!

Çend rojan piştî
wê bûyerê.





Ez tazî ji
zikê diya xwe
derketim!

Û ez ê tazî
vergerim gorê
erdê!
Xudan pir
tişt da min!



Û niha,
Ew wan bi tevahî
stand!!!

Ey Xudan, bila
navê pêroz be!

Ez nizanîm
ew Te çima hişt
ev yeka bibê!

Tiştî ku ez
dikarim bikim ew e
ku ez ji Te ji bo hêza
Te û rihetiyê lava
bikim...



Ka wê
bigire!



Rojeke din, hebûnên ezmanî hatin pêşberî Xudan.

Û dîsa, yê pêşî yên ketî hat li nav wan.

Min ji we re got ku tu kes mîna xulamê min tune ye, Jon.

Te wî kir ku li dijî min bizivire, lê yê rast ew hê zilamekî bêkêmasî ma.

Ji dil, tenê ji bo sedemeke!



Tu destûr di dest min de tune bû ku ez dest li wî bikim.
Lê û jiyana wî?
Wê zilamekî dev ji hertîştî ji bo can û jiyana xwe berde!
Ewê çêrî bikira heger goşt û histiyê wî hatîban derdkirin!



Ez ê wê yekê nekim çêbe.

Tu difikirî ku tu encama wê dizanî.


Lê bi rastî ez wê dizanim û hemû hûngiliyên wê yên herî biçûk.

Va ye min ew da destê te.

Tu çî dixwazî bi wî bikî bike, lê dest need canê wî.



Bi rastî "hûngilî û encamên biçûk".





Çêrî Wî bike
û bimore!!!

Ma em ê qencyê
ji Xwedê qebûl bikin
û xerabiyê ji Xwedê
qebûl nekin?

Min van gotinên
beredayî ji yên din
bihîstiba lê ne ji
devê te!

A niha ez
wî jî winda
dikim...









Va ye ew!!!

Va ye!!!

Gelo tu
piştrast î? Va...
Ew... hema hema
mirov e!



Eyûb, me wextê
li ser te bihîst me hema
xwe rakir û hat!

Di destpêkê de,
hemû tişt tev zarokên
te ji dest te çûn!

Û niha
ev jî!!!



Ax, Eyûb...
Li min
bibore!!!

Wek ku kevneşopên me
ji me re dibêjin, emê bi
te re şin bikişînin,

Gelek spas...
dostên min...





Di rojgirtineke de,
yên pîrxwedêperist dibêjin
ku yên Livyetan ji kûr ve
xwe çedikin ku rojê tune
bikin!

Bila yên Livyetan
ronahiya wê rojê
ku ez hatim dinê
tune bikin!

Lê ew ê bimire,
çimkî ew roja heta
tarîtiyê hat nalet
kirin!

Ew tu çi
dibêjî?

Divê ez ji
jidayikbûnê
bimirabam!

Yên mirî,
dewlemend û belengaz
qencî û xerabiyê û yên
din bi dest wan e!

Tenê
pîrsgirêka min
heye...

Dema ku em li nav
demên dijwar re derbas
bûn, te piştî me xurt kir
ku em hêviya xwe li
Xwedê bikin.

Û niha, ma
divê hêviya te
tune be--

Eyûb, ev bû ye
em çend roj li vir
in. Gelo dibe ez
tiştekî bêjim?

Heger tu hêviya min tune
be, çimkî hêza min ji bo
hêvîkirinê tune ye.

Eyûb, Xwedê
bêgunehan ceza
û tune nake!

Heger tu
xerabiyê dajo û
belayê diçînî, tê
çi bidirû?

--heger tu bi
rastî wek ku te
xuya kir bêkêmasî
yî?

Ka ji min
re bêje, Êlîfaz,
çî?



Xerabî û
bela!!!

Te tiştêkî kiriye
heta ku tu hêjayê
vî tiştî bibî!
Di şevêk bêxew
de, dîtiniyeke
min hebû...



Ruhek di ber min re
derbas bû û li pêş min
sekinî û got:

Ma mirov
dikare ji Xwedê
rasttir be?

Ma mirov
dikare ji Xwedê
rasttir be?

Heger milyaket
dikevin, îcar ew bi yên
ku li xaniyên ji herriyê
çêkirî rûdinin, eynê
wan ji axê ye û beriya
bizûzê diperçiqin
ewle ye?



Li gor serpêhatiyên
min û tiştên ku min li wan
salan dîtin, va ye ji te re
şîreta min, Eyûb..

Li Xwedê
bigere!

Û şa bibe, çimkî
Xwedê xwast ku
te sererastbike!



Şa bibe? Bi
vî awayî?

Ew vê yekê dike ku alîkariyê te
bike! Ew dibe ku te birîn bike, lê
Ew birîna te jî dipêçe!

Ji bo guneha xwe ya
xerab tobe bike û tê
baş bibî!

Êlîfaz, gelo
dibe ez tiştêkî
bêjim?



Zarokên min mirin e û
bedena min jî bi nexweşiyê
diloq dike!

Lê min li ser Xwedê
qet dudilî nebûye û ne
jî min gotinên Wî
înkarkirîye!

Ka nîşan bide min
min çî xerabî kirîye
da ku ez hêjayê vê
yekê bibim û ezê
bisekinim!



Tu nikarî,
ne wisa?

Ka li çavê min
binêre, Êlîfaz!
Ka bibîne
heger ez derewan
dikim dema ku ez
dibêjim ku ez
bêguneh im!



Oh, ya Xwedê! Goştê canê
min bi xwîn, ax, kurmikan
û bi nêmê hatiye
gurmizîn.

Ez di êş û jana
de diqîrîm û hewar
dikim! Tu tehlbûnê di
ruhê min de dibînî!

Li gor gotina
Êlîfaz, gelo min tu
guneh kirine? Ka
nîşan bide min!



Dema ku
tu nîşan bidî min,
tu dizanî ez ê tobe
bikim!

Nîha Ez tenê
dixwazim li ser erdê
rakevim û bihêlim ku
bedena min biçelmise
û bibe toz...

Eyûb?

Gotinên devê te mîna
bayê rabûyî ye!

Xwedê nake ku
edalet şaş bibe!

Heger tu paqij û
rast bibûya, bêguman
Ewê niha bersiva te
bidaba te.

Ka li ser bavên
me û şahrezayiya wan... û
şahrezayiya bavûkalên
wan... bifikire

Rojên me li ser erdê
kurt û kin in, loma
divê em ji şehrezay-
iya ya bavûkalan
hînbibin.

Ka der wê darê
ku av lê tune bifikire.
Wisa ye wî mirovî ku
Xwedê jibîrkirîye!

Dexlûdanên
mirî ji kokê ve
hatin rakirin û
cotkar jî
nexwaze careke
din li nav wan
bixebite --

..Ew wan
davêje!


Nexwe Xwedê
yên bêkêmasî
navêje!
Û bi destê
yên xerabkaran
nagire!
Eyûb, tobe bike û
Ew ê devê te bi ken
tije bike!



Bîldad, eger ez zilamekî herî paqij û herî rastdar bam jî, min ê dilovaniya Wî bixwastiba!

Da ku ez li ber yekî pîroz mîna Wî werim, ez navbêjekî dixwazim ku li şûna min biaxeve!

Lê kî? Tu kes tune ye!



Ya Xwedê, destên Te min çêkirin, îcar ew çima dixwazin min xerab bikin?

Ew çima min hişt ku ez bi çavê xwe jî ronahiya roja bûyîna xwe bibînim.

Ew çima tarîstan li jiyane belav kir, heger min karî li tarîstanê bimaba?



Gotin lêborînê û xilasiyê neynin!

Tu dibêji ku tu paqij î, tu dibêji ku tu bêguneh î - Lê gotina vî tiştî nake tu wisa bî!

Ya ku ez nabêjim ev e!



Gotin!
Gotin!
Gotin!



Xwedê bi mirovên xapînok dizane, Eyûb! Ew hay ji mirovên xerab heye!

Û yên bêhiş û bêaqil ku ji hespan û wêde nabin mîna şeherzan!

Îcar tu kîjan jî wan î, Eyûb?
Mirovê xerab, mirovê derewker an jî yê bêhiş?



Tobe bike, Eyûb.
Dilê xwe amade
bike û xerabiyê jî
ji xwe bavêje.

Hingê tê bi
hêvî û cesaretê
bikarî!

Lê hêviya
mrovê xerab
dibe hilmeke
mirî!



Wê hemû ji bo
şehrezayiyê li ku
ve herin heger hûn
her sê bimirin?

Eyûb, ev ne
wextê te û tinazên
te ne...

BAH! Ka te çend
gotinên şehreza tîfkirin, lê
ew tev bi ehmeqî û biaqiliyê
te ku tu vedireşî re çûne!



Ka li dinyayê
binêre, Êlîfaz!

Hin car hene ku
mrovên
dadmend û rast
birçî dibin û diz jî
zêde dibin!

Bîldad, şehrezaiya
zîlamên mezin ji gelek
salan û ji bavên wan ve
hatine standin, lê
hemû şehreza ji Xwedê
ve tî!

Ey Sofar, tu min
sucidar dikî, ku bi
Xwedê re bipeyivim, lê
gotinên te bi tevahî
derew in!

Derew!

Metelok ji xwelî
hatine çekirin! Cedel
jî ji ax û herriyê
hatine çekirin!



Eyûb, em
tenê dîkin ku
em alîkariya te
bikin!

Hingê devê
xwe bigire!

Çi dibe Xwedê
dike bila bibe, lê
ez ê bi Wî ewle
bim.

Çimkî Xwedê
dadmend, qenc û
rastdar e û xilaskarê
min e!



Ya Xwedê,
ez ji nû ve ji Te
dixwazim...

Bi min re
biaxave û ez ê
bersiva Te
bidim!
An ji min bihêle
ez biaxavim û Tu
jî bersiva min
bide!

Ew çima Tu rûyê
Xwe ji min vedişêrî?
Ma ez dijmînê Te
me?



Eyûb, devê
te yê derewker
lome li te dike!

Tu ji
Xwedê
natirsî!

Ka li beden
û li rûyê min
binêre, çimkî
ew bi vî awayî
ruhê min
dihese!



Te gavên
min jimart...

Te li ser
gunehê min
girt û nixamt...

Te bedeneke
û ruheke da
min...

Lê li goştê min ji xeynî
êşê tiştek tune; Lê li ruha
min ji xeynî xemgîniyê
tiştek tune...



Ya Xwedê, ew Tu
çima bêdeng î?

Ew Tu çima
dihêlî ku dostên
min biaxavin?

Beden û
ruhê min hatine
şikestin û ez hê
têm tinazkirin.

Tu şehrezayiya
dostên min ku parve
bikin tune ne, tenê
lome kirin û tarîfî
hene!





Tu ku ji min
re dibêji ku xerabî
van hemû tişt bi serê
min anîn...

Divê tu ji şûrê
bitirsi!

Biryara
dadgehê!

Heger ev yeka
ji bo xerabiya min e,
hingê bisekine û
bibîne wê çi bi serê
te were!!!

Te... Min... Ma tu çawa
wêrî vê gotinê
bêji!?!

Tu yî ku ji bo
xerabiya xwe hatî
ceza kirin, ne em!

Hûn herdem
dibêjin ku ev yeka bi
serê min tê çimkî ez
xerab im, lê ew min
çi kiriye?

Te ji me
hertişt veşart,
Eyûb.

Ax, divê xerabiya
te tiştêkî şêrîn taem
kiriba, ku xwe di bin
zimanê xwe de ji dinê
veşartîye...

Lê jehra veşartî
hê jehr e dema ew
were daqurtandin!


Yê xerab
qedereke xwe
yek heye!

Xudan xezeba
Xwe li ser wan dibarîne
wek ku ew di kin ku
xezîneyên xwe yên
biçûk bi dest xwe de
bihêlin!

Lê ji xeynî tozê
tu tişt ji wan re
nema ye!

Ew eynî mîna
meseleya te
ye!

Sofar, ka li
min binêre!



Heger tu min bi vê
gotinê suçdar bikî, ka li
çavên min ên tije hêsir
û rûyê min ê tije êş
binêre!!

Tu dibêji ku
yê xerab wê
ciwan bimirin!
Lê ev yeka ne
rast e!

Baran li ser yê n rast
û yê nerast dibare!

Ez nizamim ji bo
çî... lê tenê Xwedê
dizane. Tu kes nikare
awa û tevdîrên Wî
têbigihîje!



Lê, Xwedê ne ji
bo pîroziya te te
ceza dike.

Mirovên xerab
guneha xwe ji çavên
mirbar vedîşêrin, lê
tu nikarî xwe ji
Xwedê veşêrî!

Lê Êlîfaz, ez
digerim da ku ez
dilê Xwedê
bizanibim.

Wek te got,
Xwedê dilê
me dizane.

Ew dizane ku ezê
ne bi nê, lê bi hemû
gotinên ku ji devê Wî
derdikevin bijîm...

Lê niha ez tu gotin
ji wan gotinan
nabihîzim!



Gel didizin
û tiştan xerab û
talan dîkin. Yê
belengaz birçî û
tazî ne.

Mirov mirov
dîkuje. Zîlam û
jin zîna dîkin.

Di binê tariyê de,
mirovên tarî tiştên
tarî dîkin.



li hember
karê wan, ez ne
xerab im; lê li
hember qenciye,
ez qenc im.

Û min ê wê
xerabiye tune
kiriba, eger hêza
Xwedê di dest min
de ba.

Lê Xwedê wê
yekê nake. Gelo
çima?

Belkî divê ez şa
bibim ku ew tu tişt
nake, çimkî min jî
bihatiba tune kirin!



Eyûb, gelo
tu dibihîzî tu çî
dibêjî?

Gelo min tu
tişt çewt got?

Na. Ew rast
e ku Xwedê
hêzdar, pîroz û
paqij e.
Lê
mirov?

Mirov
kurmî ye,
Eyûb!



Lo Eyûb, tu
kurmek î di
çavê Xwedê
de...

Pir pir baş
e, Bîldad!



Te dilê min
ji dil şa û bextewar
kir!

Ka ji min re bêje,
gelo te van gotinên
şehreza ji ku ve
aniye?

Eyûb, ez tenê
nişan didim te ku te çî
ji wan zanayên din
hîn bûye!

Ax. "zanayên
din" baş e,
min têgihîşt.



Rûyê erdê,
kûrahiyên okyanos
û zerya, firehiya
ezmanan--

--Xwedê wan
hemûyan afirandî û
ev jî tenê nişaneke ku
Ew çî dikare bi dest
xwe tişt bike!

Ji xeynî tehliya
ruhê min,
Xwedê hemû tişt
bi tevahî birin.

Baş e ku Ew bi
min re neaxave, lê
ez ê li dijî Wî wekî te
tu tişt nebêjim!



Her peyveke ku ez
dibêjim diêşîne, loma
ezê her peyvek bînim
hesab kirinê...

Tenê dema
min ji bo rastiyê
heye.



Padîşah erdê dikolin,
mirov dikujin ku mal û
milkan bidizin, mirovê
rast rizq û debara jiyana
xwe dikin...

Ew li zêr,
zîv û cewheran
ku ji axê ve tîr
derxistin
digerin.



Yek dikare
zêr û ziv
bikire.

Yek dikare
zêr û ziv
bikire.

Yek dikare
zêr û ziv
bide û qebûl
bike.



Lê zêr û ziv
xezîne û giranbîha
ne ku yek dikare
wan bidize!

Xezîneyeke ku
dibe were
windakirin!

Xezîneyeke ku di
dawiyê de tê windaki-
rin û diçe.

Lê xezîneya herî
baş û gewre...



Gelo xezîneya
herî gewre çi ye? Şehrezayî!

Ew ne tenê
zanîna ku ji serpehatî
an çavdêriyên
bavûkalan ve hatine
gotin,
Îcar şehrezayî
ji ku ve tê?

"Va ye, tîrsa
Xudan, şehrezayî ev
e, ji xerabiyê revîn,
feraset e."

Şehrezayî dike ku
jiyanê têbigihîje
wek ku Xwedê me bi
vê yekê dixwaze!



Xwezî ez wek
rojên berê bûma,
dema ku ez nêzîkê
Xwedê bûm!

Di wan rojan
de, dema ku ez li nav
tariyê re meşîm, min
xwe bi ronahiya Wî
şûşt!



Mirovên ciwan û kal qadirê min girtin dema ku min li bajêr kursiyê xwe bi wan re amade dikir.

Ne mîna we, dostên min! Wê mîrza û meziniyên me bihîstiba dema ku min diaxavi.

Çima?

Ji ber ku ez hatibûm pîroz kirin û min pîroziyên xwe dida yên hejar û hewcedar...

Min yên di bin zilm û zordariyê de parast...

Min yên xemgîn û şînê dikişandin teselî kir.

Min alîkariya yên kût û kor kir.

Ez mîna padîshahekî bûm!

Niha...

Gel bi min re ne ji kûçikan pirtir baş didin û distînin!

Êdî Xwedê
min pîroz
nake.

Ez li qencyê
digerim û xerabiyê
dibînim.

Ez li ronahiyê
digerim û tarîtiyê
dibînim.

Ez ji bo alîkariyê
hawar dikim, lê tu
kes bersiva min
nade...

Tu kes ji
xeynî... te.

Carekî, berî demeke
ne dirêj, min li tembûra
xwe xist û gel bi min re
reqîsî!

Niha, ez dinalim,
lê hûn gunehên
min dijmêrin!

Çimkî tenê
ew yeka ye ku
hertîşt rave
dike...

Na!!!

Ez bi tevahiya
jîyana xwe bi jîna xwe
re dilsoz im û min tu
car tu çav bernedaye
jinên din!
Ez herdem
rastiyê dibêjim!

Min alîkariya
yên hewcedar
kir!

Ez tu car bi
bextreşîya dijminê
xwe nebûme
bextewar!



Dibe ku hûn
bi min bawer nekin,
ne hûn lê Xwedê
dadger e!

Heger we tu
tiştî rast li ser min
gotiban, hingê ew çima
biryara Xwedê zûtir bi
serê min hat?



Ev mîna ne
tu tiştî ye ku min li
jiyana xwe dîtibe,
lê --

Wek ku me
got, gelo em
çawa dikarin bi
awayên Xwedê
bizanibin?

Tu hatî ceza
kirin, lê tenê
pîrs der wê çî
ye--



Bisekine!!!
Dostên min...
Ez ji we biçûktir
im, loma min
devê xwe girt.
Divê hûn tije
şehrezayî bin, ew hê
ya min tune ye!
Lê ez bawer
dikim ku ew ne
herdem rast e!



Êlîhû,
serpêhatiyên
me ji te pirtir
in...

Lê te bi şahrezayî
û serpêhatiya xwe tenê
bi Eyûb re qerqêşe û
nîqaş kiriye--

--û heta niha
tu wî nerast
dernexistiye!

Hûn wî tenê şermezar
der gunehêke ku
çênebûye derdixin!



Gelek
spas,
Êlîhû...

Tu spasî ji min
re neke, Eyûb.
Ez dixwazim
çend tişt jî bêjim!



Tu li dijî Xwedê dikî gazin, çimkî Ew tu bersiv nedaye te û ne jî Xwe ji te re rave kiriye!

Xwedê diaxave, lê ne herdem bi wî awayî ku tu bixwazî!



Xewnek... peyvan... milyaketek...

Û serpêhatiyan... û kevneşop... û ceza...

Dema ku Xwedê diaxave, ew jî ji ber ku tu Wî bizanibî!

Dema ku Xwedê ceza dike, ew jî ji ber ku tu li Wî bizivirî!



Em hemû ji yên tiştên ku em distînin hêja yên xerabtir in!

Ew tiştê ku dike me dike em xwe ji tarîtiyê bizivirînin û herin ba ronahiyê!

Êlîhû, ez bêguneh û bêsuc im, lê Xwedê tu fersend nade min! Ew hê bersiva min nade!



Ew ji te tu tişt înkâr nake!

Heger Xwedê li gazî û hewarên xapînok guhdar nake--

--Heger Ew bi wan ên ku bi qurretiyê diaxavin tu tişt nake--

--Wê ji ber çî a niha bersiv bide? Ew tenê ji ber ku tu ji bendewariyê westiyayî yî?



Xwedê derd
û bela bi tu
kesî neyne!

Ew perwerdekar
e, çimkî zangona ku
Ew fêr dike eynî
zagon e ku afirandi-
ye!

Gerdûn
bi xwe
bersivên Wî
dide!



Birûsk qet
nayê hevber
dengê Wî!

Ew ji baran
û berfê re dibêje
kengî bibarin û kengî
bisekinin!

Ba qet ne
mîna hilm û
nefesa Wî ye!

Û tu jî ji
min re dibêjî,
Ew bédeng
e?



Ew li vir
e, Eyûb!

Ew li vir e,
Eyûb!

Li gorî hinekan ez bêhiş
im, lê ez ne bi têra xwe
bêaqil im ku mîna te
biaxavim.

Xwedê di hêz, edalet
û rastdariya Xwe de
mezin û gewre ye.



Tu çewtî
tuneye heger
yek ji Wî
bitirise!

Baş e heger yek
xwe li ba yekî ku emiran
li bahozeke mîna vê
bike bitewîne!

Erê rast e...



Erê...
Erê
rast e.





Eyûb?

Belê, ya Xudan!

Eyûb...



Tu diaxavî
wek ku tu hertiştî
dizanî û
têdigihêj!

Lê gotinên te
bi şehrezayiya
min kê in!

Min bersiva
bêaqiliya wan
dida...

Eyûb!!!



Ez a
niha bi te re
diaxavim!

Ne bi wan
re!

Belê, ya
Xudan.

Niha jî çend
pîrsên min ji te re
hene û ez dixwazim
tu bersivên wan
bidî!

Kerem
bike, ya
Xudan.
Ez ê... Ez
ê... bikim

Dema ku min erdê
nîgarkir, min li wê bi
ewran nixamt û min
stêrkên ku bi ronahiyê re
distirên çêkir --

-- Ma tu li
wir bû yî?

Gelo tu dikarî
der çêbûna ev
bûyera rave
bikî?

Gelo te tu
carna bi ax û herriyê
şikil daye dinyayê û
ronahî ji tarîtiyê
veqetandiye?

Te tu carna
di nav kûrahiyên
derya û zerya re
çûye?

Gelo tu dikarî
stêrkan li nav û
derdora gerdûnê
bilivîni û
bireqsîni?

Gelo şêrên
ciwan bi destê
te tîn tîr
kirin?

Ma tu rêpaniya
dema zayîna
xezalan dikî?

Ma tu hewara
têjikên ên nû
çêbûne dibihîzî?

Ma tu
hespê hêza
wî ya mezin
didî?

Gelo tu
dizanî ku
çawa teyrên
baz difirin?

Ka bersivên min
bide, Eyûb! Ma tê ji
min re bêjî ku divê
çawa tişt werin pêk
anîn?

Eee... Tu
bersivên min
tune ne.

Ka bersivên xwe der
van pirsan bide!

Behêmotê yê bi
masûlkeyên bi hêz û
hestiyên ên mîna
hesinan!

Tu tişt mîna
wî li vê dinyayê
tune ye!

Tu kes
nikare li dijî vê
rastiyê were!

Ma hêza te
wek ya min
heye?

Ma tu
dikaîrî bela bi
serê xeraban
bînî?

Livyetan!?

Ma tu dikarî
wan bi nîkê
bikişîni!?



Gelo tu dikarî
wî bigirî û bikî ku ew
bi te re bike piste-pist
wek ku tu serwerê wî
bî?

Çerm mîna
zirxdar! Sîng mîna
zinar!



Min wan
afirîdan afirandin û
tu kes nikare li dijî
wan were û
bisekine!

Îcar kê dikare
li dijî min
bisekine?

Eyûb, min
gerdûn afirand.
Min şikil da
erdê.

Min wê bi
afirîdên mezin
û biçûk tije
kir.

Min te
afirand.

Ka bi min
ewle be.



Ez dizanim
ku tu dikarî
hemû tişt bikî.

Ez dizanim ku
tevdîrên te ji tēgihîştin û
hêza mirov ve wêdetir
in.

Te yê ku şehrezayî,
hêz û rastdariya te yên
bi dest wî ne pîrskir.

Bê zanîna
tevahiya wêneyê, kî
bû wî duyem ku te
derxist û zanî?

Min.
Li min
bibore.



Tu bersivên min
der van pirsan tune
ne, tenê tu wan
bersivan dizanî.

Heta niha, min
jiyana xwe bi tirsbûna
ji te ji ber tiştên min
bihîstin derbas kir.


Û niha, min
te bi çavên xwe dîtî
û bi guhên min
bihîstin...



Min
bibexîşîne!

Şehrezayiya te
bi min re tune ye, lê ez
dikarim bi şehrezayiya
te ewle bim!

Çavên min li hindira
min dinerîn; Niha
çavên min tenê li te
dinêrîn!




Ez ji te ne
xeyidî me,
Eyûb.

Tenê pirsên te der
min û der tiştên din
hebûn, lê te tu carî li
dijî min neaxavî.

Ez te dikim
xulamê xwe; Ez te dikim
dostê xwe.



Û herwisa
we hersê...



Min bi Eyûb
re peyivî û min wî
sererast kir ne ji
ber ku ew min
hêrs kir.

Lê we wê
yekê kir.



We der hêz û
edaleta min axavî,
lê we der serwerî û
dilovaniya min
piştguh kir!

We ji Eyûb re
got ew derewker,
durû gunehker e!
We got ez wî ceza
dikim!

We bi tu
awayên rast li ser
min mîna Eyûb
nepeyivî.



Divê heryek ji
we heft conega û heft
beranan bikire û ji
min re wek qurbana
şewitandinê raber
bike.

Ez ê li şûna we
duaya Eyûb qebûl
bikim û ez ê tu tişt li
gorî hûn hêja ne
nedim.

Tobe bikin.







Dostên Eyûb bi ya
Xudan kirin.



Û herwiha Eyûb jî
bi ya Xudan kir.



Ya Xudan,
dostên min bi
vê qurbanê
tên ba te!

Ew têdigihîjin
û ji bo gunehên
xwe tobe dikin!

Ew jî ber
gunehên xwe li
dijî te vê qurbanê
pêşkêş dikin!

Û Xudan soza xwe
bi cih anî.





Êlîhû, ez
te spas dikim ji bo
piştgirtina min.

Û ez jî te ji bo
hevalitiya te ya mayî
spas dikim.



Bawer bike,
min got ku me
tu winda kir.

Ez piştrast
bûm ku Xwedê
te ji min jî
dibir.

Min wî jî
dixwast... heta
ku ew bi min re
peyivî.



Xwezî ew
bersiva te
bidaba!

Wî bersiva
xwe da!

Lê wî jî
te re negot
ew çima!

Wî bersiva
xwe ya ku min dixwast
neda min, lê wî bersiva
xwe ya ku pêwîstiya
min bi wê hebû da
min.



Ez nizamim me
yê hertişt têbigihîştiba
heger me hemû
sedem bizaniya.

Lê ez der hêz,
rastdarî û hezkirina
Xwedê ji me re ne
dudilî me.

Xwedê nîvê jiyana Eyûb
yê duyem ji yê yekem
bêtir pîroz kir.

Pîştî demeke kurt, pez û ajalên wî ji
destpêkê pirtir çêbûn û herwiha
deh zarokên wî zêde hatin dinê.

Û ji ziriyeta wî
gelek nîfş jîyan.

Û piştî gelek sal û
bi emirekî mezin
wî wefat kir.



SUPERBIBLE.TV